# JINEOLOJÎ

## AMADEYÎ

## 2

2021/2022

**AMADEKAR**

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Jineolojiyê ve hatiye amadekirin.

**LÊVEGER**

- Komîteya Şopandinê
- Komîteya Fotoşopê
- Komîteya Redekteyê

Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, weke pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.

# PÊŞGOTIN

Jineolojî di bingeha xwe de zanisata jinê ye û di heman demê de zanista jiyan, hevjiyana azad û civakê ye. Li ser sedem û çavkaniya pirsgirêkên jin û civakê radiweste. Ji ber ku koka tevahî zanistan, civak e. Zanîna rast û baş bi rêveberiya civakê bi pêş dikeve, lê em îro dibînin ku zanistên civakî aloziyan dijîn û bandorê li hemû zanistên din jî dikin. Ji ber vê jî jineolojî li ser feraseta ku zanist girêdayî hev in û bandora wan li hev heye, analîz (tehlîl) dike û dinirxîne. (dîrok, ekolojî, aborî û hwd).

Her weha jineolojî li ser zayendpersetiya civakî lêkolînan bi pêş dixe û guftûgoyan derbarê azadkirina zayendperestiya civakî dê çawa bê derbaskirin, dike.

Ji ber ku ev teoriyeke nû û nêrîneke nû ya jiyanê ye, mirov dikare bibêje ku jineolojî wê bibe teza herî mezin û ji bo jiyaneke baş û bedew, rê li ber guhartinan veke.

# NAVEROK


## BEŞA YEKEM

**DANASÎNA JINEOLOJIYÊ ............................ 7**

Derketin, Pênase û Rêgezên Jineolojiyê ............ 9

Girîngî û Armancên Jineolojiyê ...................... 13

Mijarên Jineolojiyê yên Lêkolînê .....................17

## BEŞA DUYEM

**Têkiliya Jineolojiyê bi Zanistên Din re....... 23**

Jineolojî û Zanistên Din (1) ....................... 25

Jineolojî û Zanistên Din (2) ....................... 32

Jineolojî û Zanistên Din (3) ....................... 38

## BEŞA SÊYEM

**Zayendperestiya Civakî ......................... 43**

Zayenda Civakî û Fîzîkî ............................ 45

Zayendperestiya Civakî ............................ 49

Rizgarbûna ji Zayendperestiya Civakî ............ 54

# BEŞA YEKEM

# DANASÎNA JINEOLOJIYÊ

1. Derketin, Pênase û Rêgezên Jineolojiyê
2. Girîngî û Armancên Jineolojiyê
3. Mijarên Lêkolînê yên Jineolojiyê

## ARMANCÊN BEŞÊ

**Pêwîst e xwendekar di dawiya vê beşê de:**

- Girîngî û sedemên derketina jineolojiyê, nas bike.
- Armancên jineolojiyê nas bike.
- Mijarên ku jineolojî wan lêkolîn dike, nas bike.

## Waneya Yekem

# DERKETIN, PÊNASE Û RÊGEZÊN JINEOLOJIYÊ

### Gelek zanist hene, lê çima zanistek ku jinê dike mijara xwe tune ye?



Ji bo avakirina hêz û zanisteke hevgirtî û ji bo derbaskirina hemû kombûnên ku li ser hin rastiyên ku em wan dijîn, tên pêkanîn, her weha ji bo watedayîna jiyan û civakê, da ku ji nêz ve û li gorî nêrîneke bêalî bên şopandin û ji bo çarekirina hemû reftarên çewt ên di derbarê rastiyên jiyana civakî de, jineolojî hat avakirin.

### Derketina Jineolojiyê



Jineolojî, weke têgih û teorî (nezerî), di sala 2008`an de ji hêla Ramyarê kurd ê sosyolojiyê Ebdullah Ocalan ve hatiye avakirin, balê dikşîne ser zanistan û di

zanistên civakî de nebûna jinê, weke pirsgirêkeke bingehîn dinirxîne.



Ji ber vê yekê jî di nava zanistên civakî de, pêwîstiyê bi zanisteke girêdayî jinê dibîne û hişmendiya zayendperestiyê ya ku li ser zanistên civakî serdest e, rexne dike.

Jineolojî, zanisteke nû ye, lê rehên jineolojiyê xwe digihînin dîrok û têkoşînên jinan. Di encama serpêhatiyên jinên Kurdistanê û Rojhilata Navîn de, derdikeve û bi pêş dikeve.

## Pênaseya Jineolojiyê



Têgiha jineolojiyê, ji peyva "jin" a kurdî û peyva "lojî" (logos) a latînî pêk hatiye. Ew weke peyveke hevedudanî, tê wateya "zanista jinê". Ew jî weha tê nasîn:

Zanisteke ku hemû pirsgirêkên girêdayî jinê û têkiliya wê bi jiyan û civakê re, lêkolîn dike. Her weha ji bo avakirina jiyaneke azad û hevbeş di navbera jin û mêr û civakê bi giştî de û ji bo ku em bigihêjin wateyeke rast

ji jiyanê re, hewl dide li rastiya jinê, dîroka wê û hemû nirxên bedewî û sincî, bigere.

## Rêgezên Bingehîn ên Jineolojiyê:



1. Hevjiyana azad a ku li ser bingehê azadî û wekheviyê ava dibe, bingeh digre.
2. Jineolojî, hevtemamkirina peywendiyên jin û mêr weke xeleka herî girîng, dike bingeha lêkolînên xwe.
3. Jineolojî, mirov weke hebûneke girêdayî xwezayê û paşê girêdayî civakê dibîne.
4. Desthilatdariya zilam di hemû qadên jiyanê de, rexne dike.
5. Hevtemamkirinê di navbera zanistên civakî (civaknasî, dîrok, mirovnasî, şûnwarnasî ... hwd) de, bingeh digre.
6. Jineolojî li ser sedemên dîrokî û civakî yên ku bûn sedema kêmbûna rola jinê, radiweste û ji bo çareseriyê, dahûrandin û nêrînan, bi pêş dixîne.
7. Vegerandin û tekezkirina hebûn û nasnameya jinê, ya ku ji aliyê hin zanistên din ve hatiye paşguhkirin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Jineolojiyê pênase bike.

2. Di derbarê derketina jineolojiyê de, biaxive.


3. Ji rêgezên jineolojiyê, çar rêgezan şîrove bike.

### LÊKOLÎN

Jineolojî weke bersiv ji bo nêzîkatiyên **şaş** di derbarê rastiya jin û jiyana civakî de, derketiye. Lêkolîn bike û nêrîna xwe diyar bike.

## Waneya Duyem

# GIRÎNGÎ Û ARMANCÊN JINEOLOJIYÊ



Ji destpêka avabûna hemû zanistan ve, roleke diyar a jinê hebû, lê belê bi derketina pergala hişmendiya zilam a serdest re, êdî jin ji gelek  qadan hat dûrxistin û rola wê tenê di karê malê û anîna zarokan de hat  sînordarkirin.

Ji bo ku zanist li gorî pirs û pêdiviyên mirovan li pêş bikeve û ji ber ku zanist di cewherê xwe de ji bo civak û peydakirina pêdiviyên wê ye, divê vegere wate, bingeh û xwezaya xwe. Her weha dûrî desthilatdarî û berjewendiyên wê bikeve.

**Gelo jineolojî dikare tiştekî nû derbasî nava jiyanê bike?**

### Girîngiya Jineolojiyê

Di rêya birêvebirina jinê ji civakê re, jinê pergaleke civakî ku tê de aştî û dadwerî heye, pêk anî. Her weha rola jinê di gelek afrînerî û kifşên Serdema Neolotîkê de xuya bû. Ji ber vê yekê sedema ku dihêle em berê xwe bidin zanista jinê ew e ku bi awayekî baş rola jinê ya ku di xurtkirina nirxên sincî û estetîkî di hemû qa-

dên jiyanê de, nirxandiye û girîngiya jineolojiyê di rêya doza tiştên li jêr hatine rêzkirin re, daye pêş:

1. Xwegihandina raza jiyanê, jiyan weke nirxê ku di ser hemû nirxan re ye, bê dîtin û erkê wê yê bingehîn têgihaştin û derbaskirina nezaniyê ye.
2. Ji bo rêgirtina li ber jihevdûrketin û aloziyên ku li ser civakê hatine sepandin ku rê li ber aloziyeke civakî vekiriye, jneolojî doza avabûneke rast ji bo hevjiyaneke azad dike.
3. Geşkirin û hişyarkirina jinê, ji ber ku ew beşa herî girîng a xwezaya civakî ye.
4. Di hemû zanistên civakî de û di hemû qadan de û bi taybet ên girêdayî rola jinê, şoreşek, bê lidarxistin.
5. Rêbazekî lêkolînê ku hemû danasîn, taybetî û hestên jinê ku digire dest, li pêş bixe.

## Pîvan û Armancên Jineolojiyê

Jineolojî hewl dide ku hemû nirxên civakî yên erênî vegerîne û bi rêxistin bike. Her weha wan di bîrgeha civakê de tomar bike. Li ser derxistina rastiyan û bilindkirin û xurtkirina asta zanistê li gel jin û mêr ku bigihêjin asta herî bilind ya rêxistinê, kar bike.



Ev yek di rêya xalên li jêr pêk tê:

1. Xurtkirina nirxên civakî yên erênî mîna; rastî, rêzgirtin, hevkarî û hwd.
2. Xwegihandina asta xwenasînê û geşepêdana ramanên azad û wekheviyê.
3. Girêdayî rastiya jinê, naskirin û lêgerîna li çareseriyên pirsgirêkên civakî.
4. Li gorî bipêşxistina ramana hevjiyana azad; ji nû ve pênasekirina rola jin û mêr.
5. Di nava beşên zanistê de, bipêşxistina têkiliyan; bi çavên hevtemamkirinê temaşekirina li hemû zanistan û bipêşxistina rêbazan.
6. Di nava zanistan de, jiholêrakirina hişmendiya zayendperestiyê û bipêşxistina guhartinan.
7. Bi civak û saziyên civakî re, parvekirina encamên lêkolînên xwe yên projeyên çareseriyê.
8. Derketina li dijî qirkirina gel, çand, civak , xwezayê û tundiya li ser jinan.
9. Li hember reftar û ramyariyên neynî yên ku dibin sedema hilweşîna xwezayê, hişyarkirin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Sedema pirsên li jêr diyar bike:
    a. Kêmdîtina jinê û dûrxistina wê ji piraniya zanistan.
    b. Pêwîstiya bi jineolojiyê.
2. Jineolojî hewl dide ku jiyaneke hevbeş û azad, ava bike. Binirxîne.
3. Pênc rêgez û armancên ku jineolojî hewl dide ku wan pêk bîne, diyar bike.

## LÊKOLÎN

Di Serdema Kevirî ya Nûjen (Neolotîk) de, rola jinê, di avakirina civakê de, roleke bingehîn bû. Vê yekê lêkolîn bike.

## Waneya Sêyem

# MIJARÊN JINEOLOJIYÊ YÊN LÊKOLÎNÊ



Di aliyê civakî de, jineolojî di lêkolînên xwe de hewl dide, li rastiyê bigere û di rêya nirxandina aliyên erênî û neyînî rêbazên nû bibîne. Her weha bi xwespartina li ser şarezayî û hestên jinê û bipêşxistina zimanê danûstandinê di navbera zanistên civakî de ji bo ku bikaribe pêwîstiyên jiyana civakî peyda bike û li hember aloziyan, raweste.

### Mijarên bingehîn ên lêkolînan ev in:

Jineolojî, hinek mijaran lêkolîn dike û rexne û nêrînên xwe yên ji bo guhartinan di rêya hin xalan re derbirîn dike. Her weha hewl dide ku wateya wan a rast derxîne holê, ew jî ev in:

- **Efsane:**



Şahmaran

Bi qasî ku jineolojî li aliyên erênî yên efsaneyan ku bi hezarên salan bandor li hişmendiya mirovahiyê kiriye û ew qas hewldanên olî û zanistên pozîtîvî hatine kirin ku wan ji bîra mirovahiyê rakin, dinêre; jineolojî ew qasî bi awayekî rexnegerî nêzî wan jî dibe. Ji ber vê yekê, jineolojî di lêkolînên xwe de, berê xwe dide mîtolojiyê ku ew jî awayekî lêgerîna li rastiyê ye.

- **Ol:**

Ji ber ku olê rê li ber bipêşketina hizra zanistî û felsefeyî vekiriye û aliyê wê yê din beşdarî bipêşxista rêgezên sincî di civakê de bûye û ji ber ku sinc yek ji rêgezên bingehîn ên jineolojiyê ye, ew bi rêzdarî nêzî beşdarbûna olê di jiyana civakî de, dibe. Li aliyekî din jî hişmendiya şaş a olî ya ku jin dorpêç kir û nasnameya wê bi reşkirinê nîşan da û rola wê di beşdarbûna jiyana civakî de veşart û hişmendiyeke ku li gorî berjewendiyên dewlet û desthilatdariyê ava kir, rexne dike.

- **Felsefe:**

Yek ji armancên jineolojiyê yên vekolînkirina felsefeyê ew e ku felsefeya binirx di qada lêkolînê de, bi dest bixe. Ji ber ku civaka bêfelsefe, têkiliya wê bi rastiyê re qut dibe. Ji bo vê yekê, jineolojiyê lêkolînkirina zana û fîlozofan ji xwe re weke bingeh girt û bi taybet şopa fîlozofên jin ên ku ji aliyê tevgerên felsefeyî yên ku rajeyê ji hêzên desthilat re dikin, hatine çewisandin lêkolîn dike.

- **Zanist:**



Avahiya zanistê, di Serdema Neolotîkê de bi awayekî berfireh ji avahiya wê ya di serdema me ya îro de, cudatir bû. Agahiyên jinê yên di derbarê şînatiyan de, êdî avahiyek ji biyolojî û bijîşkiyê re amade kir. Her weha rola wê ya di warê çandinî û çavdêriya heyv û demsalan û gelek agahî û zanistên din de, derxist holê, lê belê ev zanist û agahiyên berhemdêr, di serdema bajarvaniyê de hatin şêlandin (dizîn) û bûn beşekî desthilatdariyê û tevî ku zanist gelekî hate guhartin û lipêşxistin, lê belê

ew lipêşxistineke neyînî bû. Êdî kapîtalîzmê zanist li pêş nexist, lê ew li gorî hişmendiya xwe bi kar anî, ev jî bû sedem ku jineolojî di rêya hin xalan re, bi kûrahî li pirsa zanistê binêre, ew jî ev in:

1. Pênaseyeke nû û rast ji zanistê re bê dayîn.
2. Rêbaza zanistî ya ku hemû qadên jiyanê di nava xwe de dihundirîne, ji xwe re weke bingeh bigire.
3. Ramana dabeşkirina zanistan rexne bike. Her weha li ser hevtemamkirina wan, kar bike.
4. Tekezkirina rêgeza bingehîn a ku dibêje zanist di rajeya civak û xwezayê de ye.
5. Ji bo avakirina jiyaneke civakî û rast, balê dikêşe ser yekîtiya sinc û zanistê.

Tevî xalên li jor, jineolojî derbarê hevjiyan û danasîna xwezaya jin û mêr û têkiliya di navbera wan de û çawaniya guhartina hişmendiya zilamê serdest, her weha di derbarê berhemên devokî û nivîskî, serbûrî û zanyariyên jinan de, bi lêkolînan radibe.

**Mînak:**
Di derbarê jinên helbestvan de, bi lêkolînan radibe. Dîsan dîroka devokî di gotin, stran, pend, çîrok, gotinên pêşiyan û hwd de yên ku ji hêla jin û dayîkan ve hatine parastin, lêkolîn dike.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Jineolojiyê di lêkolînên xwe yên derbarê jiyana civakî de, bal kişandiye ser çi?
2. Yek ji mijarên ku jineolojî wan lêkolîn dike "felsefe" ye, şîrove bike.
3. Jineolojiyê bi kûrahî li zanistê nêriye û çend armanc destnîşan kirine. Sê armancan ji wan diyar bike.

## LÊKOLÎN

Rola jinê di gelek efsaneyan de heye, yekê ji wan lêkolîn bike û nêrîna xwe diyar bike.

# BEŞA DUYEM
# TÊKILIYA JINEOLOJIYÊ BI ZANISTÊN DIN RE

1. **Jineolojî û Zanistên Din (1)**
2. **Jineolojî û Zanistên Din (2)**
3. **Jineolojî û Zanistên Din (3)**

## ARMANCÊN BEŞÊ

### Pêwîst e xwendekar di dawiya vê beşê de:

- Têkiliya jineolojiyê bi zanistên din re, nas bike.
- Rola jineolojiyê di sererastkirina zanistên din de, nas bike.

## Waneya Yekem

# JINEOLOJÎ Û ZANISTÊN DIN (1)



Jineolojî, bi armanca derxistina sedem û encamên pirsgirêkan û di zanistên civakê de çêkirina guhartinan, li ser zanistên weke dîrok, aborî, demografî, sinc û bedewî, ekolojî (jîngehnasî), tendirustî û ramyariyê dahûrandinan bi pêş dixe. Hemû zanist girêdayî hev in û bingeha xwe ji civak û xwezayê digirin. Ji ber vê yekê jî jineolojî zanistan girêdayî hev û bandora wan a li ser hev dinirxîne.

### Yekem: Jineolojî û Dîrok



Ji bo rastiya jinê derkeve holê, divê dîrok û civaknasî ji nû ve di ber çavan re bên derbaskirin. Armanca xwegihandina agahiyên rast, ronîkirina girêdana jinê ya bi jiyan û civakê re ye. Her çiqasî dîroka fermî, daneyan veşêre û şaş şîrove bike jî îro gelek dane li ber çavan diçe-

sipînin ku dîroka jinan, beriya dîroka desthilatdariyê ye û ji bo avabûn û bipêşxistina civakê, bi nirxên bingehîn tijî ye. Peykerên ku di encama lêkolînên arkolojiyê de hatine bidestxistin, nîşan didin ku girêdana jinê ya bi civak û xwezayê re pir xurt e. Di van deman de, ji aliyê jinê ve, di qada zanistê de gavên şoreşgerî hatine avêtin.



Jineolojî, lêkolînên dîrokî ji bo ronîkirina nasnameya jinê girîng dibîne û dixe nav xebatên xwe yên bingehîn. Pênaseya jinê, bi tenê dikare bi lêkolîneke rast a dîroka jinê bê kirin. Ji ber ku pênaseyên ji hêla pergala desthilatdar ve hatine kirin, berhemên hişmendiya zayendperest in. Ji mîtolojiyê heta olan, ji felsefeyê heta zanistan, ev hişmendiya zayendperest bibandor e. Di hemûyan de, tê dîtin ku jiyana civakî li gorî van pênaseyan, hatiye sazkirin.
Ji bo jiyaneke watedar, hişmendiya dîrokî pêwîst e; divê bi çavên jineolojiyê dîrok û çanda gelan bi rengekî rast bên dîtin.

## Duyem: Jineolojî û Ramyarî

Ramyarî ango polîtîka, di cewherê xwe de zanist û hunera birêvebirina civakê ji kar û barên xwe re ye.

Heger erkê sinc di jiyanê de pêkanîna karên baş be, erkê ramyariyê jî peydakirina karên baş e.

Ji bo ramyariyeke rast û demokratîk bi pêş bikeve, divê pêwistiyên civakê di nava rêgezên bingehîn ên wekhevî û demokrasiyê de pêk bên. Di vir de pêwîst e azadî û mafê jinê, neyên jibîrkirin.



Di ramyarî yan rêvebirineke demokratîk de, vîn û mafê jinê tune bin, di wir de ramyarî ji peyva demokrasiyê dûr dikeve.

Bi taybetî, jin ji qada ramiyariyê hatine dûrxistin û li ser jinan ramyariyên taybet di hemû qadên jiyanê de, hatine meşandin. Di nava malê de rista dayîktî, guhdan, pêkanîna pêdiviyên zilaman û hwd, li ser jinan hatine sepandin.

Di dîrokê de jinan têkoşîna ramyarî, mafî û civakî meşandine û heta niha jî têdikoşin. Jinên ku di qada ramyariyê de cihê xwe digirin, cardin li hemberî hişmendiya zayendperest di nava têkoşînê de ne. Ramyarî weke zanist bê civak û civak jî bê ramyarî, nabe. Ji ber vê yekê jineolojî li ser têgiha ramyariyê lêkolînê dike û wateya wê ya resen li gorî van xalên li jêr zelal dike:

1. Hilweşandina hişmendiya desthiltdar a ku xwe dispêre dewletbûn û ramyariyê weke amûra xapandin û çewisandinê bi kar tîne.



2. Zelalkirina hemû tiştên ku hatine fêrkirin û xwendin, her weha diyarkirina wan û vekirina deriyê guftûgoyan di navbera kes û civakê de, da ku hêza afirandin û afrîneriyê pêk bê.
3. Beşdarbûna jin, xort û tevayî pêkhateyên civakê yên din di ramyariyê de, da ku civak bikaribe xwe bi rê ve bibe.

## Sêyem: Jineolojî û Aborî



Aborî weke çalakiyeke civakî ya ku jinê roleke bibandor tê de lîstiye, tê dîtin. Ji ber ku beşa herî mezin a alavên berhemdayîna heyberî, ji aliyê jinê ve hatiye afirandin û jinê muhra xwe li çanda xwarin û kincan xistiye.

Karbeşiya di navbera jin û mêr de, bi hezarê salan di

nav hevsengî û hevtemamkirinê de hatiye meşandin. Lê belê bi derketina pergala dewlet û serdestiya wê re, pirsgirêkên aboriyê bi dûrxistina jinan ji çalakiyên aboriyê dest pê kir. Tevî ku kedkarên bingehîn ên aboriyê dayîk in, lê di encama bipêşxistina polîtîkayên aboriyê de, wate û naveroka peyvê hatiye guhartin. Weke sedem jî xwezaya jinê hatiye nîşandan û ev yek weke hişmendiyekê li ser civakê hatiye ferzkirin. Keda jinê ya nava malê di pênaseya zanistên aboriyê de, ji kedê nehatiye hesibandin. Di malbatekê de bav li derve, dayîk jî li malê kar bike; serdestiya aboriyê di destê bav de ye.

Ramyariyên aboriya kapîtalîst li ser keda civakê û xwezayê bê sînor dimeşin. Ji bo berjewendiyên xwe, xwezayê tune dikin û îro li dijî xweza û civakê teknolojiya nûjen bi kar tînin.



Di bingehê de, yek ji sedemên bingehîn ên nexweşiyên laşî û derûnî, aboriya li dijî xwezayê ye. Xwarin û vexwarin, kîmyayî ne, cilûberg û amurên xemlandinê, ne xwezayî ne, lewma îro li gelek weletên cîhanê xebatên çandiniya xwezayî, xwarin û vexwarina xwezayî, pêk tên.

Lewra pêdivî bi jineolojiyê heye ku di nava hişmendiya pergala aboriyê de, nêrîna zayendperest û desthilat-

dar were guhartin û ber bi aboriya civakî ve gav bên avêtin.Her weha pêdivî bi avakirina aboriyeke jîngehparêz û civakî heye ku hemû beşên civakê bikarbin bi rêya sincê aboriya civakî derbarê biryarên hilberîn û parvekirinê de, xwedî maf bin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Sedema pirsên li jêr diyar bike:
    a. Jineolojî, di piraniya zanistên civakî de, lêkolînan li pêş dixe.
    b. Divê perwerdeya rast û naskirina çand û dîroka gelan, di rêya jineolojiyê re be.
2. Xalên ku jineolojî ji bo derxistina wateya rast a ramyariyê, xwe dispêre wan, bîne ziman.
3. Di qada aboriyê de, pêwîstiya bi jineolojiyê, zelal bike.


## LÊKOLÎN

Bandora neyînî ya teknolojiyê li ser civak û xwezayê heye, vê yekê lêkolîn bike û rola jineolojiyê di peydakirina çare û berdêlan de, diyar bike.

## Waneya Duyem

# JINEOLOJÎ Û ZANISTÊN DIN (2)

### Çarem: Jineolojî û Sinc û Bedewbûn (Etîk û Estetîk)



Ji ber ku sinc pênaseyên zelal li gorî bawerî û kevneşopiyan dide kiryarên qedexe û neqedexe, ew roleke girîng di jiyana kes û civakan de dilîze. Her weha û ji ber ku sinc, komeleyeke tore û rêgezên birêxistinkirî ye, ew civakê ber bi pêşketin û geşbûnê ve, bi rê ve dibe. Ew weke binkeya bingehîn di avakirina civakê de, tê dîtin.

Di derbarê bedewbûnê de, dema ku mirov bi hestê ku danûstandin û hemahengiya azad a ku di navbera behreyên nîgaşî û têgihaştinê de pêk tên, hestyar bibe; wê demê her kes dikare bi hestê bedewbûnê hestyar bibe.

### Gelo pîvanên xweşikbûnê yên destnîşankirî hene?



Têgih û rêgezên bedewiyê li gorî serdem û çandan ji hev cuda dibin. Ji bo vê li gel hinek kesan tu pîvanên bedewiyê tune ne û


pênase û rêgezên wê ji kesekî heta kesekî din, ji demekê heta bi demeke din û cihekî heta cihekî din, ji hev cuda ne. Ji ber ku hestkirina xweşikbûnê rêjeyî ye, nepêkan e ku rêgezek li ser pîvanên wê bê sepandin. Ji ber ku hin tişt hene du kes li



ser xweşikbûna wan, nêrînên wan ji hev cuda nabin; hin kes van tiştan bi rengekî asayî dibînin û hin kes jî bi yekcarî van tiştan nabînin.

**Mînak:**
Kevala hunerî ya ku bala hezarên kesan dikêşe, di nêrîna wan de ew lûtikeya bedewiyê ye, lê li aliyê din jî tu wateya wê li gel hin kesên din tune ye.

Lêkolînerên ku di derbarê jinê de, lêkolîn kirine, dibînin ku hêzeke xurt a bedewiya teşeyî û derveyî heye ku dihêle jin herî zêde balê bide laş.



Her weha derfetê dide her du zayendan ku jinê ji ber sedemên laşî ve binirxînin ku di rêya niştergeriyên

ciwankariyê re, girîngiyê didin bejinziravî, rengê çav, lêv û teşeyê rû.



Rola jineolojiyê ji nû ve nirxandina pîvanên bedewiya rast û jiyana xweşik, di rêya xurtkirina guftûgoyên ramanî û zanistî de, avakirina felsefeyeke rast ku li ser bingeha azadî bixwe xweşikbûn e û ji ber ku mirovê cewher û xwezaya xwe wenda kiriye nexweşik e, xuya dibe.

Sinc û bedewbûn (Etîk û Estetîk); du hêmanên bingehîn ên jineolojiyê ne û bê wan mirov nikare dabaşa zanisteke tam bike. Xweşikbûna rast, di sinc, axaftin û hizirîna baş de ye û bandora xwe li teşeya derveyî dike. Êdî di xweza û hemû teşeyên jiyanê de, tiştekî nebedew tune ye ku pîvana xweşikbûnê li gorî têgihaştina mirov û civakê ji wateyê re, cuda ye.

Jineolojî jî ji bo biryargirtina rast a ku bi jiyan û zanistê ve girêdayî û xwegihandinda civakeke azad, berpirsyariya rêxistin û bedewkirina jiyanê hildigire ser milê xwe.

## Pêncem: Jineolojî û Tendirustî



Tendirustî têgiheke ku bi mebesta pêkanîna hevsengiya hemû erkên laşê mirov yê di rêya rahatina (guncawbûn) bi jîngeh û faktorên hawirdora wî re pêk tê, tê gotin. Ji ber vê yekê ji demên kevnar ve xwedî cihekî girîng e.

Li gorî gelek jêderên dîrokî, di serdemên kevn de, gelek rêbazên dermankirin û çêkirina dermanên ji şînatiyan li ser destê jinê hatine lipêşxistin. Her weha bingehên zanistên tendirust bi rêya pisporiya jinan hatine danîn.

Lê belê bi domana demê re, rola jinê bi giştî ji qadên bijîşkî û tendirustî tevî ku rola wê mezin bû, hatiye paşguhkirin. Desthilatê dest danî ser hemû qadên tendirustî û li gorî berjewendiyên xwe di rêya afirandina hin nexweşiyan û belavkirina wan di nava civakê de, ew keysbaz kiriye.

Êdî ev beş ji beşekî rajeyî ber bi bazirganiyê ve çûye. Ev jî bû sedem ku tevgerên jinan hejmara kedkarên tendirustî zêde bikin û hişmendiya paşguhker ji holê rakin.

Di vir de rola jineolojiyê di rêya van xalan re, xuya dibe:



1. Avakirina sazî û akademiyên tendirustiyê.
2. Vekolîn û naskirina rêbaz û raboriyên bijîşkiya xwezayî.
3. Di qada tendirustî de mafên jinan bê parastin û rola wan di belavkirina perspektîvên tendirustî de, bê tekezkirin.
4. Li tevahiya cîhanê, bi tevgerên tendirustî re, pêkanîna hevkariyê.
5. Bi rengê sincî nêzîkatiyên bijîşkiyê, bên sazkirin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Sedema pirsên li jêr diyar bike:
   a. Di jiyana kes û civakan de, sinc roleke girîng dilîze.
   b. Etîk û estetîk, du hêmanên bingehîn ên jineolojiyê ne.
2. Ji bo ku pîvanên xweşikbûnê yên rast, ji nû ve di ber çavan re derbas bibin, rola jineolojiyê çawa diyar dibe?
3. Di rêya çend xalan de, girîngiya jineolojiyê, di qada tendirustî de xuya dibe, wan bîne ziman.

## LÊKOLÎN

Qada tendirustî di dema me ya niha de, bi awayekî mezin hatiye keysbazkirin û bûye sedema belavbûna gelek nexweşiyan. Vê yekê lêkolîn bike û nêrîna xwe ya teybet di derbarê vê yekê de bide.

## Waneya Sêyem

# JINEOLOJÎ Û ZANISTÊN DIN (3)

### Şeşem: Jineolojî û Ekolojî

Jîngeh: Ew koma tiştên ku li derdorê ne û bandorê li hemû zindiyên li ser rûyê zemînê dijîn û di nava wan de: av, ba, ax, kanza û avhewa, dikin.



### Sedema Derketina Jîngehnasiyê (Ekolojî)



Di encama serdestiya şaristaniya dewletdar di xwezayê de, her weha xirabiya têkiliya civakê bi xwezayê re, jîngehnasî derket holê. Di encama vê destwerdana serdest de, civakek dijberî xwezayê hatiye avakirin. Ev jî li wê hişmendiya ku xwe dispêre xirabî, talankirin û desthiltdariyê vedigere. Êdî xwezaya bedew

û xemilandî, cihê xwe ji xwezaya xirabkirî re, hişt. Ji ber vê yekê hemû pirsgirêkên jîngehî, di encama ramyariyên desthilatdar ên ku li dijî xweza û civakê ne, derdikevin holê.



Mînak: Bikaranîna çekên kîmyayî, li ser çeman çêkirina bendavan, talankirina girseyî ya daristanan û qirêjkirina ava çem û deryayan.

Êdî saman û binesaziya cîhanê ji aliyê kompaniyên kapîtalîst ve rastî talankirinê hatine û bi domana demê re, gelek cureyên şînatî û lawiran hatin tunekirin.

Ji bo vê, jineolojî lêkolînên pirsgirêkên jîngehî di qadên aborî, felsefe û civaknasiyê de di rêya hevpariya bi xwezayê re, digire ser milê xwe. Ji bo ku rê li ber van pirsgirêkan bigire, van çareyan pêşkêş dike:

1. Her tişt girêdayî xwezayê ye û pêwîstî bi hevsengiya jiyana zindiyan heye.
2. Nûkirin û parastina dahatiyên xwezayî.
3. Ji qirkirinê parastina cureyên şînatî û lawiran.
4. Girîngîdayîn bi paqijî û geşepêdana jîngehê.
5. Bipêşxistina çanda çandin û parastina daran.
6. Têkoşînkirin li dijî ramyariyên hilweşîner ên ku li ser xwezayê, tên pêkanîn.

## Heftem: Jineolojî û Demografî




Peyva demografiyê, tê wateya zanista hejmara şêniyan. Beşekî civaknasî û erdnîgariya mirovî ye ku weke zanist, taybetiyên niştecihan ji aliyê pirbûn, pêkhate û nijadê ve, her weha serjimêriya zêdebûn, koçberî, mirin û jidayîkbûnê ... lêkolîn dike. Ew di zelalbûn û naskirina guhartinên mirovî de, roleke girîng dilîze.

**Desthilatdariyê çawa bandor li ramyariya dolê kiriye?**



Ramyariya ku hişmendiya kapîtalîst ew destnîşan kiriye, hişt ku jin bibe alava zarokanînê bêyî ku guh bidin metirsî û nexweşiyên ku ziyanê digihînin jiyan û tendirustiya jinê. Her weha şêwazên serdestiya di zarokanînê de, weke beravêtin û destnîşankirina zayendê û gihandina geşepêdana çanda baviksalariyê di anîna zarokên mêr de û berdewamkirina ramana ku zarokên xort dê nijad; an jî bi wateyeke rastir dê desthilatdariyê berdewam bikin, xuya dibe.

Êdî hiştin ku ev raman di civakê de cih bigire; êdî ramyariya zêdebûna niştecihî di bin serweriya ol, dewlet û desthilatdariyê de ma.



Ji ber vê yekê, jineolojî hewl dide di rêya rexneyê re, demografiyê lêkolîn û sererast bike, ew jî bi vî awayî ye:

1. Hişyarkirina civakê û bilindkirina asta têkoşîna civakî.
2. Di qada demografiyê de, bingehgirtina felsefeyeke nû ku xwe dispêre ramana mafê jinê di zarokanînê de heye.
3. Ji bo şkandina felsefeya berdewamiya nijadê ya şaş, divê têgiha demografiyê baş bê zelalkirin û analîzkirin.
4. Têkiliya demografiyê bi aborî, civak û jîngehê re, her weha têkilya wê bi qadên ramyarî, perwerde, fêrkirin û tendirustî re, vekolîn bike.
5. Ji bo şkandina hişmendiya paşverû ya zanista demografiyê, hewlên lipêşxistina dîtaneyên (teorî) civaknasî bên kirin û bi hişmendiyeke nû bên pêkanîn.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Sedema pirsên li jêr diyar bike:
   a. Avakirina jîngehnasiyê (ekolojî).
   b. Qirbûna gelek cureyên lawir û şînatiyan.
   c. Ji aliyê hişmendiya kapîtalîst ve, xurtkirin û geşepêdana çanda baviksalariyê.
2. Di qada jîngehê de, jineolojiyê çend çare diyar kirine, çar xalan ji wan diyar bike.
3. Jineolojî di lêkolînên xwe de, di rêya hin xalan re, berê xwe dide lêkolîn û sererastkirina demografiyê. Vê yekê zelal bike.

### LÊKOLÎN

Awa û sedemên qirêjkirina jîngehê pir bûne, li gorî devera tu lê dijî, van sedem û awayan lêkolîn bike û li gorî nêrîna te, çareserî çi ye?

# BEŞA SÊYEM
# ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ

**1. Zayenda Civakî û Fîzîkî**
**2. Zayendperestiya Civakî**
**3. Rizgarbûna ji Zayendperestiya Civakî**

## ARMANCÊN BEŞÊ


### Pêwîst e xwendekar di dawiya vê beşê de:

- Cudahiya di navbera zayend û zayenda civakî de nas bike.
- Dirûv û teşeyên zayendperestiyê nas bike.
- Çareyên girîng ên ku jineolojiyê di qada fêrkirin û perwerdeya civakî de pêşkêş kirine, nas bike.

## Waneya Yekem

### ZAYENDA CIVAKÎ Û FÎZÎKÎ

**Çi cudahî di navbera zayend û zayenda civakî de heye?**




Di xwezayê de, bi awayekî giştî zayend li gel hemû zindiyan (mirov, lawir û şînatî) tiştekî asayî ye.
Ji hêla fîzîkî ve, taybetiyên xwezayî û cudahiyên diyar ku bi navê "zayendê" tên nasîn, hene. Ev cudahî ne kêmanî yan jî lawaziyeke, lê belê ji bo kesayeta mirovî dewlemendî ye.
Ji bo berdewamiya zindiyan, hebûna her du zayendan tiştekî girîng e. Lê ev cudakirin, tenê li gel mirovan heye û her du zayend yek bi navê "jin" û yek bi navê "mêr" tên binavkirin.

### Taybetiyên Zayendê

- **Xwezayî:**

Li gel mirovan, zayend tiştekî xwezayî ye, di destpêka ducaniyê de tê destnîşankirin. Ji hêla zanistî ve, dema ku kromozoma "xx" be, dê zarok mê be, lê ku "xy" be, dê zarok nêr be.

- **Biyolojîk:**

Di dema gihaştinê de, rêjeya hormonên zayendî li gel her du zayendan "mê û nêr" bilind dibin , ev bilindbûn jî di laş de, dibe sedema guhartinên fîzyolojî, ev her du hormon:

  a. **Hormonê astrojenê** li gel keçan, dibe sedema diyarbûna heyvik, sing û hwd.
  b. **Hormonê tîstostîronê** li gel kuran, dibe sedema stûrbûna deng, derketina mû li hin deverên laş mîna rihê û hwd.

## Zayenda Civakî

Ew tevahiya rol, reftar, çalakî û taybetiyên ku ji aliyê civakî ve hatine destnîşankirin û di rêya perwerdeya civakî re, tên avakirin. Ew jî li gorî kevneşopî, nirx û pîvanên civakî, asta wekheviya di navbera her du zayendan de û dadmendiyê de, ji civakekê heta civakeke din ji hev cuda dibin. Her weha dibe ku bên sererastkirin an jî bên guhertin û bibin zayendperestî.

## Cudahiya di Navbera Zayendê û Zayenda Civakî de:

| Zayend | Zayenda Civakî |
|---|---|
| Cudahiyên biyolojîk di navbera nêr û mê de. | Rolên civakî yên ku jin û mêr bi wan radibin. |
| Bi demê re nayê guhartin. | Bi demê re tê guhartin û bi hin faktorên derveyî bandor dibe. |
| Cudahiya di navbera nêr û mê de, di hemû zindiyan de û li hemû deverên cîhanê, yeksan e. | Bi cudabûna ol, çand, temen, reng, nijad, çîna civakî û rewşa civakî ji hev cuda dibe. |

**Gelo rolên civakî neguherbar in û çima?**

Rol û erkên civakî, li gorî çand û xwezaya her civakekê tên guhartin. Ev jî nîşan dide ku rola jin û mêr guherbar e.

**Mînak:** Di civaka xwezayî de, di Serdema Neolotîkê de, rola mêr tenê di warê nêçîrvanî û parastina klanê de bû û di heman demê de, rola jinê di hemû aliyan de; di rêxistinkirin û birêvebirina klanê de bû.

Ev rol xwezayî û jixweber bûn û ne li ser ramanên dabeşkirina kar û erkan dihatin avakirin, lê belê, bi demê re û bi derketina hişmendiya zilamê serdest re û serweriya wê li ser jiyana civakî, jihevcudakirina her du zayendan dest pê kir û rolên li gorî wê hişmendiyê ji wan re hatin diyarkirin û heta ku weke tiştekî rewa û xwazî hat dîtin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ


1. Van têgihên li jêr pênase bike:
   a. Zayendê ji hêla fîzîkî ve.
   b. Zayenda civakî.
2. Taybetiyên zayendê bihejmêre û şîrove bike.
3. Cudahiyên di navbera têgiha zayend û zayenda civakî de, çi ne?

## LÊKOLÎN

Rolên civakî tên guhartin, ji demekê heta demeke din û ji civakekê heta civekeke din, ji hev cuda ne. Rola jin û mêr di civaka xwe de, lêkolîn bike û nêrîna xwe diyar bike.

## Waneya Duyem

### ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ



Perestî, bi rengekî giştî, ew çewisandin û newekheviya ku kesek yan jî komek civakî ku di danûsatandinê de, pê re rû bi rû dimîne. Ev yek di jiyana rojane û civakî de, di qadên cur bi cur ên mîna kar, fêrkirin, kirêdest û hwd diyar dibe û bi şêweyekî pir zelal di navbera jin û mêr de, xwe dide der û bi taybet li hemberî jinê.

### Zayendperestî



Zayendperestî: Di girtina helwestên neyînî yên ku li hember zayendekê di rêya rolên civakî û taybetiyên kesayetî jî diyar dibe û li gorî cih û demê dirûvê wê tê guhartin.

Ji vê zayendperestiyê, ji dema avakirina hişmendiya zilamê desthilatdar û şaristaniya navendî ve û di rêya reşkirian rastiya jin, kêmdîtin û di rêya pergala baviksalariyê de ku ew bingeha zayendperestiyê ye; para mezin a jinê bû.

**Çawa cudahiyên xwezayî di navbera jin û mêr de hatin bikaranîn û ew kirin zayendperestiya civakî?**



Di serê kesên ku bi ramanên van pergalan bawer in de, ev hişmendî hat çandin û vê rêbazê rol û berpirsyariyên jin û mêr, destnîşan kirin. Vê yekê jî bi rengekî zelal di rêya cudabûna lîstik û perwerdeyê di navbera kur û keçan de, bandor li ser perwerdeya civakî kir. Ji bo ku keç ji rola dayîkbûnê re amade bin; lîstikên bûkan ji wan re tên kirîn û ji bo ku kur ji rola serwerî û desthilatê re bêne amadekirin; lîstokên cengê û tirmbêl ji wan re dihatin kirîn.


Weke ku **Newal Else`dawî** dibêje: **"Min li dibistanê hevokên cudaperestiyê xwendin (Sûad dimale û Ehmed dixwîne - Zeyneb dipêje û Seed dinivîse) ji bo ku xwe ji koletiya pêjkirin û malandinê rizgar bikim û mafê xwendin û nivîsê bi dest bixim, min têkoşîn kir."**

## Qadên ku zayendperestî di wan de xuya dibin:

Zayendperestiya civakî, rêbazekî hizirî ye, jin ji piraniya qadên jiyanê dûr xist û bi rengekî berfireh di nava civakê de hat sepandin û pejirandin.

**1. Qada Aboriyê:**

Jin weke amûrekê ji bo reklaman tê bikaranîn û karên wê biçûk, kêm an jî bêkirêdest tên dîtin.



**2. Qada Ramyariyê:**

Piraniya pergalên ramyariya dewletan; tu maf di zagonên xwe de nedan jinan û derfet ji wan re nehatiye dayîn ku bi rengekî çalak beşdarî qada ramyariyê bibin.

**3. Qada Zanistê:**

Zanist bi hişmendiya zayendperestiyê bandor bûye û bû sedem ku rastiya jinê bê berovajîkirin û hemû berhemên wê bên paşguhkirin.




Mînak: Ji ber ku ramanên fîlozof û zanaya bîrkariyê "Hîpatya" li dijî ramanên dema xwe bû, hat kuştin.

**4. Qada Çand, Wêje û Hunerê:**

Di berhemên hunerî yên weke şano, muzîk, wêne û hwd de, jin hatiye dûrxistin û nehatiye pejirandin.

**5. Qada Civakî:**



Di vê qadê de, jin tenê weke amûra zarokanînê tê dîtin û rûmet ji keda wê re nayê dayîn. Her weha gelek maf ji bo mêr hatine dayîn û yek ji wan; li gorî kevneşopiyan kuştina jinê mafekî rewa ye. Mînak: Tawanên namûsê. Her weha dema ku jin bixwazin biryaran derbarê jiyana xwe de bistînin jin ji aliyê bav, bira, hevjîn û xizmên xwe ve, li hemberî tundiyê rû bi rû dimînin. Bi serdema kapîtalîzmê re, ev rewş kûrtir bû; laşê jinê hat parçekirin û bêyî ku tu nirxên sincî û civakî berçav bên girtin, ji her parçeyekî re, buhayek hat danîn.

Ji tiştên borî, ji me re diyar dibe ku rewşa jinê ya di asta duyem de û rolên ku di civakê de ji bo jinê tên dayîn, bi qasî ku girêdayî hişmendiya zayendperestiya civakî ne, ne girêdayî biyolojiyê ne.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Têgihên li jêr pênase bike:
   a. Perestiyê bi rengekî giştî.
   b. Zayendperestî.
2. Bandora zayendperestiyê li perwerdekirina civakî, rave bike.
3. Qadên zayendperestiya li dijî jinê, bihejmêre û yekê ji wan şîrove bike.

## LÊKOLÎN

Zayendperestiya civakî di qada zanist û fêrkirina jinê de, diyar bûye. Vê yekê lêkolîn bike û nêrîna xwe di derbarê wê de bîne ziman.

## Waneya Sêyem

# RIZGARBÛNA JI ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ



Di qadên jiyanê de, hişmendiya zayendperst gelek pirsgirêkên civakî bi xwe re tîne. Mînak: tundî, zordestî, cudakirin, jihevdûrxistina her du zayendan ...
Ji bo avakirina têkiliyeke xwezayî û hevtemamker, divê bi hemû awayan li dijî hemû cureyên zayendperestiyê têkoşîn bê kirin û bi rêya zindîkirina wateyên rast ên rasteqîna civakî bi şêwazekî zanistî, felsefeyî û etîkî û estetîkî, bê lêkolînkirin.
Jineolojî hewl dide gelek çareyan pêşkêş bike û ji wan jî ev in:



1. Di hemû qadên hişmendî û sazûmanî de, rêgirtina li ber zayendperestiyê.
2. Li ser rol û hebûna jinê ya ku li ser bingeha azadiyê tê avakirin, bê tekezkirin.

3. Dûrketina ji hemû cureyên çanda mewdakirinê (mulkirin).
4. Nirxandina têgiha wekheviya di navbera her du zayendan de û rêzgirtina wan ji hev re.
5. Ji bo ku her du zayend, di avakirina civakê de rola xwe ya herî durist bilîzin, berpirsyariya hevbeş û çawaniya parvekirina kar, bên pênasekirin.



Di encama xalên derbasbûyî de, her du qadên herî girîng ku çareserî di rêya wan re pêk tê, ev in:

## 1. Perwerdeya Civakî

Ew prosesa ku ji destpêka jiyana mirov, heta dawiya jiyana wî berdewam dike. Ji malbatê dest pê dike û her ku mirov mezintir dibe, qada wê jî berfirehtir dibe. Di danûstandinên civakî yên bi armanca ku mirov reftar û pîvanên li gorî rolên civakî bi dest bixe, diyar dibe.

Ji ber ku perwerdeya civakî bingeha avakirina pêşeroja civakan e, jineolojî girîngiyeke giranbuha dide vê qadê û ji bo dûrketina ji zayendperestiyê, gelek çareyan dide û ji wan jî ev in:

a. Perwerdekirina kes li ser nirxên sincî ji bo avakirina reftarê wî yê civakî,.
b. Rêxistinkirina têkiliyên di nava malbatan de (perwerdekirina zarokan di nava malê de, berpirsyariya

jin û mêr e, bêyî ku cudabûn di navbera wan de hebe).

c. Ji bo pêkanîna jiyaneke birûmet, çarekirina nakokiyan.

d. Xwerizgarkirina ji kevneşopiyên neyînî û geşkirin û xurtkirina yên erênî. Derketina li himber hin kevneşopiyên kevn ên mîna (qelen, ketina devê rê, pirhevjînî, berdêlî û hwd) û li ser vê çandê, civak bê avakirin.

## 2. Perwerde û Fêrkirin

Armanca bingehîn a perwerde û fêrkirinê, di hemû qadên jiyanê de avakirina kesayeteke hemaheng û hevseng bi civakê re ye. Lê ji ber ku ramyariya perwerde û fêrkirinê ya birêxistinkirî, ew ji rêya wê ya rast derxistiye; jineolojî hewl dide çareseriyan di rêya hin xalan de bibîne, hinek ji wan ev in:



a. Rêbazên perwerde û fêrkirinê, ji nû ve di ber çavan re bên derbaskirin.

b. Nezaniya ku di nav civakê de hatiye belavkirin û sepandin, ji holê bê rakirin.

c. Geşepêdan û xurtkirina helwestên etîk û estetîkî yên li hember rastiya jinê.

d. Ji bo ku jin rastiya xwe nas bike û ji hişmendiya zayendperestiyê rizgar bibe, divê bên perwerdekirin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di qada rasteqîna civakî de, jineolojî hin çareyan pêşkêş dike. Sêyan ji wan diyar bike.
2. Çima jineolojî girîngiyeke giranbuha dide perwerdekirina civakî?
3. Di qada perwerde û fêrkirinê de, jineolojî çi çare pêşkêş kirine?

## LÊKOLÎN

Yek ji diyardeyên neyînî yên ku di civakê de belav bûne; zewaca keçên temenbiçûk e. Sedem û encamên wê lêkolîn bike.

# BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Derketin, Pênase û Rêgezên Jineolojiyê | Derketin, Pênase û Rêgezên Jineolojiyê |
| Cotmeh | Lêkolîn | Girîngî û Armancên Jineolojiyê | Girîngî û Armancên Jineolojiyê | Lêkolîn |
| Mijdar | Mijarên Jineolojiyê yên Lêkolînê | Mijarên Jineolojiyê yên Lêkolînê | Lêkolîn | Jineolojî û Zanistên din 1 |
| Berfanbar | Jineolojî û Zanistên din 1 | Jineolojî û Zanistên din 1 | Lêkolîn | Jineolojî û Zanistên din 2 |
| Rêbendan | Lêkolîn | Nirxandin | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | Jineolojî û Zanistên din 3 | Jineolojî û Zanistên din 3 | Lêkolîn | Zayenda Civakî û Fîzîkî |
| Avdar | Zayenda Civakî û Fîzîkî | Lêkolîn | Zayendperestiya Civakî | Zayendperestiya Civakî |
| Cotan | Lêkolîn | Rizgarbûna ji Zayendperestiya Civakî | Rizgarbûna ji Zayendperestiya Civakî | Lêkolîn |
| Gulan | Lêveger | Nirxandin | | |